# Têgehê Azadîyê
# Bi Dîtina Saykolojîy
# (Saykolojîya Azadîyê)




**D. Nesredîn Îbirahîm Gulî**
**Beşê Derûnzanî Ya Giştî - Zankoya Zaxo**

**Destpêk**

Azadî (fredom yan Liberty) yan (Alhurîye) wekî têgehek û wekî bihayek ji serdemê bûna mirovî were heta noke û hetahetayê jî dê ji layenê mirovî û mirovayetîyê ve pê hêtegotin û axftin. vî çemkî û vî bihayî cihê xo yê di hemî

zanistên mirovayetîyê da hey û her êk ji van zanist û liqên zanistî bi dîtina xo temaşey wê diketin û wê şirove û rave diketin, ji berhindê ko ev babete gelekê girêdaye bi mirovî û bûn û man û gîyanê wî ve. hîç êk ji van zanistên girêdayî bi mirovî û mirovayetîyê ve neşên xo ji kartêkirin yan bdwîvdaçûn û hizir têdakirina azadîyê dûr bigirin.

**Pênase**

Çemkê azadîyê jî wekî her çemkekê dîtirê mirovayetîyê ye bo pênasekirinê. çemk û têgehên fîzîkî û konkirêt dişên bi şêweyekê konkirêtî û reha bihêne pênasekirin, belê têgehekê mirovayetî yê wesa nîne û her tîorî û felsefe û zanayek wekî xo wê dibînîtin û pênase û şirove û dîyar diketin.

Bisporê sosîyo - saykolojîya ramîyarî (eleswed) (1991) azadîyê  pênase diket ku" mafê mirovî ye wekî wî divêt, he bîtin yan reftarê biketin", û (Jean Roche, 1978) azadîyê bi"şîyana takî bo kontirolkirina xodê xo"  didete nîyasîn (Alasud, 1991, 217), (D. M. Çêrnov) wê bi"çareserkirin û helgirtin, ser ji nwî dirustkirina pêdivîyatîyê, û afrandina pêdivîyatîyê", û (Frants Fanon) (1925- 1961) azadîyê

bi"armanca here serekî û domahîka mirovî" didete nîyasîn û bawerîya wî ewe ko armanca jîyana mirovî li cîhanê bizavkirine bo bidestveînana wê azadîyê ya ko wî digehînîte nimûneyê (kemalê), û di axftineka xo da dibêjît: " pêdivî ye mirov nehête zîndanîkirin û girêdan, çunkî çarenivîsê mirov yê bi șêwekê azad dirust kirî û di xwazîtin ko herdem yê azad bîtin" (Hansn, 1986, 71).

**Ramana Têgeh Û Bihayê Azadîyê Di Felsefê Û Ayînî Da**

felsefê berdewam bihayên wekî cwanî, zanîn, rewişt, perwerdê û...htd, yên danayne ber vekolînê. têgehê azadîyê jî yê bi giring wergirtî û bi dîtin û bîr û bawerên feylesofan ve girêdayî û daye ber şirovekirin û rohnkirin û pêgotin û gengeșekirinê. hemîyan yan gelek ji wan rastewxo yan nerastewxo di hizir û bîrên xo yên felsefî da amajeya pêday. (Fransîs Bîkon) (1650- 1586) azadî ji wan bihayên serekî yên mirovî ye ko di kartêkirinê dikete ser reftar û kirîyarên wî da (14, 2003, Сластенин , Чижакова). û (Y.G.Fîxtê) (1762- 1814) çav li (bi. Spînoza) (1632- 1677) î diketin û dibêjît azadîyê peywendî ya bi pêdivîyatîya jîyanê û zanîn û șehrezayî û têgehiștina takî ve hey, û wekî

bihayekê giring wê didete nîyasîn, ko bêy hebûna bihayê azadîyê û azadibûnê jîyana takî dê ya bê raman bîtin (heman jêder, 20). û (Jan Jak Roso) (1712- 1778) vî bihayî hem bi dîtineka felsefî û hem ji layenê perwerdeyî ve bi giring dizanîtin bo pêgehandina layenê civakî yê zarokî û perwerdekirina wî da û bișêt reftarkirineka asayî li gel xodê xo û xelkê dîtirê dewruberê xo biketin (heman serçave, 30). dîsan perwerdekar û feylesufê Swîdî (Y.G.Bêstalotzî) (1746-1827) jî tekezê li ser bihayê azadîyê diketin wekî pêdivîyatîyeka serekî di perwerdekirin û fêrkirina zarokî da li ser binemayê dirustkirina hesta azadîyê linik wî (heman jêder, 30). feylesofên Rosî jî ji alyek dîtir ve bi çavek giranbiha temașey azadîyê diken û wê pitir ji layenê ayînî û felsefî ve şirove û gengeșe diken. (V.S.Solovêv) (1853- 1900) di babetê bawerî bi xodayê mezin û helbijartina xirabî û bașîyê da tekezê li ser azadîyê û șîyana azadibûnê linik mirovî diketin di helbijartina layenê baș û rewiştê karekî (heman jêder, 40). li nîva duwê ji sedê nuzdê felsefeya Rosî berê xo yê daye hindek arasteyên dîtir wekî:

1- Arasteya êkem: berev zanist, zanîn, rohîyeta zanistîyane pêhngav havêtin.

2- Arasteya dûhem: bizavê diketin biçîte di nav babetên rewiştî û hest û hestewerên rewiştî û azadîyê, û di vê rastê da tekezê li ser azadîyê da, û kesatîya rewiştî di sinûrên têgehê azadîyê da, diketin zêdebarî wîjdanê, dahînan û karên dahînerane, hesta berpirsîyaretîyê û xoterxankirin û wefadarîyê di belên û jivanên xo da. feylesof (N.Z.Çaçavadzê) (2003) di wê bawerê daye ko di kaudanên civakî da wekî jîyana civakî û peywendî yên mirovî li gel civakê, kesatîya takî, jîyana wî, azadî û bihayên civakî yên wî rolekê berçav têda digêrrin (jêderê pêștir, 44). herwesa (V. I. Yadov) diwê bawerê daye ko bihayên serekî yên domahîk û mebestê (Terminal Values) li gel rêzbendî ya bihayên dîtirên wekî cwanîyê, vîyanê, rewişt û dahînanê, zanistê, têgehiștinê û aqlîyê, karî û pîșey, heval û hogira, xêzan û malbatê, kaudanên jîyanê û çalak û ektîv bûn têda, bawerî bi xo hebûnê, saxlemî û tendirustê, serbixo bûnê, dan pênana civakî, aștî û tenahî parêzvanîyê peywendî li gel êk heye. ew çemk û têgeh û bihayê azadîyê bi sêhemîn biha didete nîyasîn (heman jêder, 45). zanistê pêdagokî li Rosîayê jî bi heman șêwe giringî ya bi azadîyê day di biwarê perwerdeyî û fêrkirinê da û nexasime jî li sedeyên çardê û

panzdê û şanzdê da (heman jêder, 54 û 56), vî bihayî di biwarê perwerde û fêrkirinê da bi giring dizanîtin û di pertûk û gotar û berhemên xoyên zanistî da berdewam amajê pê didetin.

Zanistê rewiştinasîyê jî wekî layenek ji felsefê peywendîya xo ya li gel azadîyê nîşan day û ya dîyarkirî ka çewa mirov ta radeyekê bê sinûr yê azade di wîsta xo da û pabend yê girêdayî nîne bi hîç egerekê ve. yan jî mirov bi helumerc û egerên derekî û navxoyî ve yê girêdayî ye. di vê rastê da dibîtin dû egerên serekî hebin ko kartêkirinê li ser kar û kirîyar û reftarên mirovî diken. ew egere jî birîtîne ji:

**Êkem:** rêbaza hebûna wîstê û şîyanê di helbijartinê da.

**Dûhem:** neçarî û bê desthelatî di helbijartinê da.

Feylesofê bernîyas (Spînoza) di vê rastê da van dû rêbazan rohn diketin û dibêjît eger mirovî bivêtin ji nexoşî û nesaxîyeka giran û koşnde qortal û azad bibîtin, li vêrê azadî encamê egerekê ye. jiber hindê pêdivî ye jibo qurtalbûnê ji vê nesaxîya giran bizavê biketin û li egerên toşbûna bivê êşê û azarê bgehîtin û bser wan da zal bibîtin û wan kontirol biketin, hingê dê şêtin bêjîtin ew yê azad bûy û yê azade. belê heker takî bivêtin bajêrekî ji rûydaneka mezin û

metirsîdara siruştî wekî av rabûnê yan bîvelerizê û erdihejînê yan her dîyardeyeka dîtir ji vî corê qortal biketin, hîngê azadî ya takî di helwêstek hosa da ya reha û bê sinûr nîne, belko berhemê pêdivîyatîyê ye. ev boçûne, dîtineka kilasîkî û kevine û pêșnîyarkirineka (mêtafîzîkî) ye. kesekê wekî (mo'tezeley) jî li ser vî binemayê kilasîkî diçîtin û diwê bawerê daye ko mirov bi şêweyekê reha û bê sinûr yê azade û ew bi rașkawane amajê bi vê çendê didetin bêy ko kaudanên jîyanê û jîyana ketwarî ya mirovî rohn biketin û liber çav bigirîtin. dîsan bêy ko pwîtey bi vê çendê bidetin ko remekên mirovî, șêwazê perwerdekirina wî, pêdawîstî yên wî û yên civakî û jîngeha konkirêta dewruberê wî çend kartêkirinê li ser wî diketin. rêbaza dûhem jî amajeê bi hindê didetin ko mirov yê bê desthelat û neçare bi her karekê ko ew encam didetin yan her reftareka ew pê radibîtin. belê, di rastîda, ew ji hindê di xafilin, ko mirov bûnewerekê wesaye hest bi berpirsîyaretîyê û helbijartinê diketin û ew bi hoșîyarane yê agehdare ji wê çenda ew encam didetin yan pê radibîtin. ew wekî berekê req û teq û hișk nîne ke tinê bo meremeka taybet ji layenê kesekî ve bihête bikarînan û havêtin û paldan. bîr û boçûnên

(Spînozay) di vê rastê da wekî dîtina layengirên hizir û bîr û bawerên ketwarî ya zanistî ne, ko kesekê wekî bin roșdî jî li ser wê bîr û bawerê û hizirê diçîtin û bawerî ya bi hindê hey ko azadî ya mirovî berhemê fakterên navxoyî (wekî fakterên cesteyî û mêntalî), û fakterên derekî yên wekî (cihî, demî, xwarn û vexwarnê, desthelat, civak û seqayê jîngehê) ye. (alhisn û axirun, 1999, 212).

Heta ko zanistê saykolojîya ramîyarî û yasa yî jî demê behsê azadîyê diken, azadîya takayetî di çarçovê civakî û dibin sîber û desthelata dewletê da sinûrdar diken. û vê azadîyê mercdar diken ke pêdivî ye li gel azadîya giştî û ya xelkanek dîtir da bigoncîtin, û eve jî bo parastina berijewendî û mifayê giştî û hemelayenî ye. ji egerê vê çendê ye ke yasayên mirovayetî yên derkeftîn daku van azadîyan bparêzîn û misoger û gerentî tir biken û di çarçoveyekê dîyarkirî da rêk bêxîn da neyne egerê kartêkirineka nerînî û xirab li ser hevdu. gelek ji azadîyên giştî yên kilasîkî wekî amiraz û kerestên karê sîyasî dihêne bikarînan. bo nimûne azadîya derbirînkirinê ji bîr û bawerên takî, ya ko li sedeê nozdê bûye egerê serhldana bendên yasayî û distûrî bo vê êkê û bêy hîç goșar û givaștinekê ji

derve, evro ya keftîye bin destê dezgehên ragehandinê, serhldana kompanî yên mezin û zebelah di bîyavên pîșesazî û abûrî da, kar yê gehandîye astekê wesa yê aloz û bi zehmet û giran ko takekê bê deramet neșêtin barê giranê wê helbigirîtin, jiber hindê (cak keyzêr, 1975) dibêjîtin ev maf û azadî ye yên mirîn û bûna wan di ketwarî nîne (Alasud, 1991, 217).

wekî dibînîn zanistên cîyawazên mirovayetîyê bi çav û șêwazên cîyawaz temașey babetê azadîyê wekî têgeh û çemkekê mirovayetî diken. belê ya ko di hemî van zanistan da hevpișk û di naveroka hemîyan da dihête dîtin û têbînî kirin ewe ko ev hemî layene ama jê didene bi pêdivîyatîya wê ji bo berjewendî û xêra giştî û mirovayetîyê û jîyana takî û goncana wê li gel civakê bi taybetî û fêrbûnê û perwerdekirin û pêgehandina civakî û kesatîya wî.

**Têgehê Azadîyê Di Dîtina Saykolojî Da**

tîorîyên perwerdîy û saykolojî jî ewên bi mebesta fêrbûnê li ser gîyaneweran hatîne encamdan yên bi giringî ya azadîyê û azadibûna takî hesîayn û bizavê diken mifay ji vê çendê werbigirin ko azadî ya takî rolekê berçav di

bilindikirina astê fêrbûna wî da digêrrîtin. bo nimûne fêrbûna pirogiramkirî ya ko li ser destê (Skinner) hatîye avakirin rolekê taybet û karame û ektîvane didete qutabî wekî takekê azad di fêrbûnê ko bi destên xo fêrket, çunkî di vî şêwazî da qutabî bixo û lidwîv azadî û wîst û arezûya xo bi wan bizav û çalakîyan radibît ewên girêday bi wergirtina ûrûjêner û azrênerên ko pê digehn û werdigirîtin, herwesa wan bersivên ko bo wan pêşkeş diketin li dwîv hel û mercên berdest û ew kaudanên fêrbûnê yên ko têda rûy didetin (Ebucadu, 2003, 186). dîyare di vê tîorî ya saykolojîkî û perwerdeyî da berovajî tîorîya kilasîkî ya (Pavlofê) Rosî ye çunkî li dwîv tîura wî gîyanewer li taqîgehek û dinav kereste û dezgehek daêxstî û sinûrdarkî da û libin taqîkirinê dihête girêdan û kontirolkirî ye. azadî ya gîyanewerê taqîkirinê jî nahête zeft kirin û standin,  bêgoman vê çendê mifayê xo û berhemên xoyên erînî yên heyn li ser dirustbûna astekê baştir û bilindtir yê palneratî û handeratîyê û bizav û çelengîyê û livînê bo rahînan û fêrbûnê.

Giringîya azadîyê bi dîtina saykolojîsta tinê bi vê çendê bidomahîk nahêtin. saykolojî nasê bi nav û dengê Emrîkî (Karl Rênsam Rocêriz) (1902 – 1987) di şêwazê binav û

dengê xo da di çareserkirina saykolojî ya bi navê çareserkirina nerastewxo (Non- Drectve) yan nexoş sentirîzimî (Cilent- Centered) da, tekezê li ser hindê diketin ko geşekirin û bilindtirkirina astê dahînanê li nik nexoşî pêdivî bi dû fakterên serekî heye, wî navên wan bi vî rengî yên desnîşankirîn (asayşa derûnî û azadî ya saykolojî) li nik takî. bi dîtina wî asayêşa saykolojî birîtîye ji pesndikirin û pejrandina xodê takî û kesatîya zarokî, ko ev kese bi kesekê goşegîr û perawêzkirî û paşvehavêtî û dwîr êxstî û neasayî nehête zanîn. û azadîya saykolojî jî lidwîv asayşa saykolojî bideste dihêtin. kesekê xodan azadî ya saykolojî takeke û dişêtin hizir û bîr û bawerên xo bi şêweyekê azad û berdayî derbibrrîtin û xo pesend biken û ji gazinde û lomehî û rexineyên xelk û kesanên dîtir netirsîtin (Muqedm, 1381, 186). dîyare (Êrîk From) (1900- 1980) bisporê saykolojê Emrîkayî bi regez Elmanî di berhemên codacodayên xo da nexasme di babetê (revîn ji azadîyê), berdewam gle û gazindê ji berovajî bikarînana azadîyê li welatên rojavayî diketin û nexasime jî li Emrîka ko ji layenê takê mirovî weku helperestîyek ya hatîye bikarînan (frum, 1379).

Ev paragirafe vê rastîyê nîşan didetin ko çemk û têgehê

azadîyê heker ji layenê zanistên dîtir ve hatbîte ravekirin û pêgotin û şirovekirin. saykolojîayê jî ev babete li pişt gohên xove nehavêtîye û ya di nav bîrdozî û tîorî û bîr û bawerên cîyawaz da gengeşe. ew tîorî û bîr û bawere bi giştî li gel wê çendê ne ko azadî û hebûna wê di geşekirin û dirustbûna kesatîya mirovî û stirakçerê wê yê domahîkê û pirosêsên pêgehandina civakî û fêrbûn û perwerderkirina reftar û kirîyara da cihekê taybet yê hey.

**Geşekirina Saykolojî Ya Azadîyê Li Nik Mirovî**

Layenên cîyawazên kesatîya mirovî wekî rewiştî (moral), zimanewanî, zanînê (cogntive), sêksî, civakî û ...htd, yên hatîne gengeşekirin û dwîvdaçûn û vekolîn, û gelek layenên wan ji alîyê tîorîkî ve çûyne di nav çarçovê tîorî yên zanistî da li sertanserî cîhanê. dinav van babetan da çemk û têgehên cîyawaz jî heman ev qonaxeyên birrîn. çemkên wekî wataya jîyanê (Meaning of life), çemkê egeratîyê (Causuality), çemkê jimareyî, çemkê demî û gelekên dîtir jî yên ji layenê bisporên saykolojî ve hatîne vekolîn û gelek ji wan jî yên bûyne tîorîyên binav û deng. belê ewa dihête têbînîkirin ewe ko çemkê azadîyê û geşekirina wê kêm ya

hatîye amaje pêdan yan jî bi degmen wekî layenekê saykolojî ji kesatîya mirovî, ji layenê bispor û bîrdozan ve ya ketîye ber vekolîn û dwîvçûnan.

Çemk yan ramana (Concept) hizireka giştî ye ji wan ezmûnên ko demê em serederîyê li gel babet û tișt û dîyarde û keresteyên dewruberê xo da dirust dikeyn yan jî ew hizir û bîr û bawerîyên dikevine di nav çarçovê hizirî yê me û jîngeh û dewruberê me da (Alalusî û Elîxan, 1983, 205). çemk pișkeke ji wê hizira mirovî yako ew bikardînîtin bo mebesta hizirkirineka ast bilind û têgehiștin ji hindek babet û rûydan û dîyardeyan ko bi şêweyekê hestewerî û rastewxo nahêne hestpêkirin û em bi destî hest pê nakeyn. zarokekê çar pênc salî dê șêtin çemkê tirombêlê yan tepkê hest pê biket, çunkî dê șêtin rastewxo destê xo bikete tepka li ser firîzê nav hewșa malê yan jî tirombêleka li kolanê hatîye seknandin, belê aya ev zaroke dê di çemkê (ayîndey), yan (dozex û behișt) yan (vîyan) yan (bextewerîy) gehîtin? vêca dê çewa çemkê (azadî) gehît?

Zanayê binav û dengê saykolojî (Sîgmond Froyd) (1856 – 1938) piștî mandîbûneka mezin û bê rawestîyan tîorî ya şirovekirina saykolojî binîyat na, ev tîorî ye wekî bawerî û

bizaveka sîyasî yan ayînî bû û bo rewşa xiraba netewê cohî ya li wî serdemî li welatê Elmanîya bi taybet û li hemî Ewropayê bi giştî dizivirîtin, ko di wan salanda ya nexoş û tejî dujminkarî û dijayetîkirinê bû ji layenê xelkê dîtirve. ev tîorî ye li ser hindek girîmane û binema û pirensîpan hatîye avakirin ko êk ji wan (binemayê çêj wergirtinê) ye. li ser binemayê vê girîmaneyê, zarok yan her mirovek her tiştekî yan karekê bi tam û çêj bîtin, dê ji ber vê tamê û çêj wergirtinê encam detin û berdewam bîtin li ser encamdana wê. ev binemaye palnerê mirovî ye di jîyanê da bi dirêjahîya hemî salên wê û berdewamîyê bo man û jîyanê li nik mirovî misogertir û gerentî tir diketin. berovajî wê jî her tiştek û kar û kirîyareka bibîte egerê êş û azar û jan û nexosîyê dê hête pişt goh havêtin yan dê tak bizavê ketin bi her rengekê hebîtin xo ji wê qortal biketin. Froydî herwesa bawerî ya bi hindê hey ke kesatîya mirovî di mawê pênc salên êkem di jîyana wî da peykerê xo yê serekî û stwîna serekîya wê dirust û ava diketin, nexasime wîjdan û layenê helçûnî divê qûnaxa jîyanê da pêk dihêtin. jêderê dirustbûna wîjdanê ew nimûne û modêl û reftarin yên deybab li van salan pê radibin û encam diden û dihêne

pêşkeş kirin, zarok çavdêrê wan hemî reftar û kirîyarane di mawê jîyana xo ya rojane û di demê serederî kirinê li gel wan da. li beramber wîjdanê, di kesatîya mirovî da sîstemekê dîtir yê hey bi navê xodê nimûneyî yan (Ego-ideal) ko jêderê wê jî her deybabn, belê cîyawazî ya wê ji wîjdanê ko wîjdan bi rêka tembîkirinê bidestve dihêtin belê xodê nimûneyî bi rêka padaştkirinê dirust dibîtin. ev xodê nimûneyî birîtîye ji  ewê têgehiştina zarok li nik xo dirust diketin ko bi bawera deybabên wî ew yarast û diruste û dihête pesendikirin û perjandin. herçende jîyana wî ya rasteqîne li gel ewan hizir û bîr û bawerên taybet yên ko lidor sêksê wî dihêne pêşkeşkirin li gel êk  û nagoncin, belê ya aşkiraye ko wî gelek hizira xo ya daye ser vî layenê jîyana mirovî. dibîtin heker wesa nebaye, piştî vedîtina girîmane û binemayên serî û nexasime jî wîjdanê li nik mirovî û êxstina wan di çarçoveyekê tîorîkî da (mîler, 1372, 298- 321), Froydî werar û geşekirina azadîyê jî li nik mirovî vedîtbaye û kifş kirbaye. demê zarok bi karekî radibîtin yan wî ew kar li nik dîbabên xo dît û encam da, paşî padaşt wergirt, dê ev reftare li nik wî bihêztir lêhêt, û demê, wekî Froyd amajeyê pê didetin, karekê zarokî bi dilê deybabên wî nebaye û

dihate sizadan, ev ew reftare dihate pişt goh havêtin û jibîrkirin, eve heman wîjdan dirustbûne yaku li destpêkê dirustbûneka hemîşeyî ya mirovî bi bîr û bawera tîorî ya (Froydî) nîşan didetin, belê wî dişîya amajeê bi hindê jî bidetin ko ev çende pişkeke ji geşekirina kesatîya mirovî li destpêka jîyanê û egereke ji bo dirustbûna çemk û têgehê azadîyê. encamdana karê baş û padaşt wergirtin û berdewamîya zarokî li ser karekî û reftarekê, anko delîveyeke bo azadîyê, azadîyeka ko hem azadî ya xodê takî û zarokî têda misogere û hem jî azadî ya deybaban, nexasime jî piştî nîşan dana çirayê kesk û rezamendîyê li ser wê reftarê. berovajî wê jî diruste. encamdana karekê nebaş û xirab û sizawergirtin, anko sinûrdarkirina mewdayê reftar û kirîyar û hizira zarokî û (neazadî ya) wî ye di wê reftarê û kirîyarê da, eve jî destpêka têgehiştina mirovî ye ji çemk û ramana azadîyê di jîyanê da. dibîtin Froydî xo hind bi hizir û bîr û bawerên xo yên taybet bi sêksî û katêkirina wê li ser kesatîyê ve mjwîl kirbîtin, ko ev layenê giring ji jîyan û kesatîya mirovî ji bîr kirbîtin, nexasime jiber egerê jîyana tehl û nexoşa netewê Cohî di wan sala da li rojavayî û cîhanê bi giştî burandî, belko jî jiber hindê bîtin ko di

binerretda ewî bi çavekê reșbînane temașey mirovî û siruştê wî û afrandina wî kirbîtin. mirov bi bûnewerek zanîbîtin ko berdewam dinavbera arasteyên dijî êkda û berdewam di kêșmekêș û milmilanêyeka saykolojî û civakî ya bê sinûr da melevanîyê diketin û neșêtin xo jê qortal biketin û bigehîte (azadîyê).

**Serhldan Û Geșekirina Saykolojîya Azadîyê Li Nik Takê Kurd**

Hizirmend û nivîserê reș pêstê Efrîqî (Frants Fanonê) di pertûka xo da bi navê (pîstê reș, demamkên sipî) (Black skin, white maskes) azadîyê û kolonîyalîzima dagîrkeraneya Efrîqayê pêkve girê didetin û bêy hindê ko amajî bi layenê dîrokî yan babetî bidetin û babetê azadîyê û siruştê wê û layen û rehendên wê şirove biketin, herçende wî di nav nivêsînên xo da siruştê mirovî bi rohnî dernebirîye û mirovinasîya xo ya felsefî li ser binemayê hîç rêçke û rêbazeka saykolojî ava nekirîye. dibîtin wî bivêtin amajê bi hindê bidetin ko azadî ya girêdaye bi bûn yan nebûna dagîrkerî û dagîrkera nive. herçende wî ev êke bi şêweyekê rastewxo di nivêsînên xoda amaje pê nedaye, belê li çend ciheka amaje ya bi hindê da ko jiber hebûn û zêdebûna

dagîrkeran li welatê  mirovî, dibîtin mirov li gel xodê xo jê bêgane bibîtin ji ber merc û kaudanên taybetên dagîrkerîyê. dibîtin ewî vîyabîtin bi rengekî cihê vî çemkî di çarçovê êk ji têgehên serekî yên tîorî ya (Karol Gostav Yong)(1875 - 1961) ê Swîdî da, anko nestê bi komel (Collective Unconscious) ruhn biketin û bikete pîverek bo geşekirin û werara çemk û têgehê azadîyê li nik takê Efrîqî. eger zanistên felsefî û saykolojîy li rojavayî û heta ko li cîhanê jî ta noke ev babete hind bi hend wernegirtbît û pwîte pê nedabît eve jî her bo vê êkî bizivirîtin ko zorbeya zanayên van biwaran û nexasime jî di van çend sedeyên borî da hemî rojavayî û Ewropî û Emrîkî bûyne û gelek ji wan welata çi carekê yan jî bi rêjeka zor karîger hest bi vê çendê nekirîye, wekî çewa Efrîqîyek yan Kurdek hest pê diketin, çunkî welatê van bi dirêjahîya çendeha sed salên borî da cihê dagîrkeran bûye û bo maweyekê dwîr û dirêj li bin desthelatîya dagîrker û dîktatorîyetê bûyne.

Li dwîv çemkê nestê kum (Allaşi'ur alcem'î) yê Yongî, weku pişkeka here giring û kartêker di sîstemê saykolojî û kesatîya mirovî da, ko cihê umbarkirina hemî hizir û bîr û ezmûn û yadgarîyên nivşê mirovî ye, ewên tak ji bab û

bapîrên xo wekî mîratek werdgirît. bi gotineka dîtir, ev pișke ji kesatîya mirovî cihê kombûna hemî wan ezmûnaye ewên di mawê çendîn hizar saleya dirustbûna mirovayetîyê da hatîye gorrê û nivș bo nivșî hatîne vegohastin heta ko noke gehiștîye me. ev ezmûne wan ezmûnên giştî û hemelayenî û bi komel bi xove digirîtin nek yên taybet û tak. li Yongî bawerî ya bi hindê hey ko ev çende bi şêweyekê bomaweyî nahête vegohastin û ya dwîre ji vê çendê, belê zarok bi hebûna wêneyekê hizirî yê giştî ji wê cîhana têda ji deyk dibîtin, dihête ser gorrepana jîyanê (purefkarî, 1380, 274). eve belgeyeke bo hindê ko Efrîqîyek yan Kurdek pișta xo pêve girê biden û berovajî takekê Ewropîyê herdem azad û azad ji deykbûy, hizirê di azadîyê û azadibûnê da biketin. çunkî bab û bapîrên wî bi sedan û hizaran salane li bin dest û çekmeyên dîktator û dujmin û dagîrkeran dinalin û xewnê bi azadîyê û azadibûnê ve dibînin. dibîtin ev hizire ya çemke bi dirêjahîya çendîn hizar salên borî da di nestê civakî yê takê Kurdî da li hemî parçeyên Kurdistanê da hatbîte umbarkirin û ji babekî bo yê dîtir hatbîte vegohastin, heta evroke jî em her xewna pêve dibînîn û xozîka bo dixwazîn. kengî Swîsrîyek yan Kenedîyek

yan swîdîyek dê di nestê xoyê civakî da vê hizirê ketin yan bi dirêjahîya hizaran salan di hizira wî da ev çende dirust bîtin ko ew bo maueyekê gelek dwîr û dirêj yan çi caran libin desthelata dagîrkeran nebûyne ?

Evro hîwa û awat û omêdên her takekê Kurd, her wekî (fanon) bo netewê xo dibêjîtin, ya girêdayî ye bidestveînana vê azadîyê ve, çunkî herwekî (Fanon) dibêjîtin erkê her êk ji me ewe ke vê azadîyê misoger bikeyn û bidestve bihînîn da xodê xo tewaw û (kaml) biketin. eveye layenekê saykolojîya kesatîya takê Kurdî ko belgeyekê haşahelnegir û selmênerê wê jî sedan raperîn û serhldanin, û hezareha şehîd û qorbanîdan û xorragirî yên takê Kurdin li hemî parçeyên Kurdstanê. demê zarokekê Kurd çavên xo li cîhanê vediketin  nestê wî yê civakî bi bîr û bawerên azadî û aştîxwazî û nîştmanperwerîyê yê hatîye avdan. herçende ko Hirorî (2013) di wê bawerê daye ko çerxê bîstê gopîtka bilindbûna astê rewşenbîrîya ramîyarî ye di dîroka netewê Kurdî da çunkî bûye egerê serhldana hijmareka bizav û livînên azadîxwazîyê li deverên Kurdistanê li dijî dagîrkerên wê wekî şureşên (Îbirahîm paşay), (Ebdulselamê Barizanî) û yên dîtir (Hirorî, 2013, 172- 193), lê bi pêdaçûna dîroka

pirserwerî û tirş û tehla Kurdistanê nîşanî me didetin ke vî netewey bo maweyekê dwîr û dirêje ev hizira azadîxwazyê ya kirîye di mêşkê xo da û ev hizire ya li gel mêntalîteyê wî da awête û têke li bûy û heta ko dê şêyn bêjîn ya bûye pişkek ji mêntalîteya kesatîya takê Kurdî. belko bidestvenehatin û nekamîya wê di vê çendê da ew ya kirî ye girê (Complex) ) yek li nik wî ko wekî her girê yeka ko bidestve nehêtin dibîte tîfan û baroveka mezin ko xo di rengê şoreş û raperînan da nîşan didetin ko dîroka Kurdistanê ji çend sed salên borî were ya pirre ji nimûneyên wan.

**Dumahîk Û Encam**

Çemk û têgehê azadîyê, wekî êk ji çemkên dîyarên çaxê evro û serdemîyane, ya bûye êk ji pirensîpên sîstemê dîmokirasîyetê li cîhanê. cîhan ya berev arasteyeka azadane û azadîya takî û neteweyî ve diçîtin û dihête hajotin. ev çemke ji layenê gelek zanistan ve hatîye şirove û vekolîn û gengeşekirin, nexasime jî ji layê saykolojîayê ve, herçende di biwarê saykolojîyê da ev vekolîne di dgmenên belê di kêmin û li gel vê êkê jî ya jibîrkirî vî çemkî bikete di çarçovê

tîorîyeka zanistî da û li ser gelek delîve û helwêst û tak û gel û neteweyan cêbecê biketin. nimûneyê here dîyarê ko ev tîorîye di şîya li ser bihête cêbecêkirin û çespandin netewê Kurdî bûye ko bi dirêjahîya hizaran salên borî li bin destên dagîrkeran û zolm û zordarî ya wan ve dinalînîtin û xewnê bi vê azadîyê ve dibînîtin. lewma jî erkê zanistî û nexasime jî yê saykolojîayê bi vê çendê girantir dibîtin demê bihête zanîn ko evroke takê Kurdî li hemî parçeyên Kurdstanê di bizav û çalakîyan daye bo bidestve înana azadîyê û yasa û pirensîp û binemayên zanistî yên bo vê çendê heyn.

## Jêder:


**١- فروم، اريك (١٣٧٩). بنام زندگى، ترجمه: اكبر تبريزى، چاپ چهارم، گلشن، تهران، (٢١٢)ص.**

**٢- هانسن، ايمانوئل (١٩٨٦). ئازادى از ديدگاه فانون، ترجمه: ح.قاچيان، كيهان سال شماره(دووم)/جلد(دوم).**

**3-Hrorî, slah (2013). bizava sîyasî û rewşnbîrîya Kurdî li destpêka çerxê bîstê ta şerrê cîhanîyê êkê (1900- 1914 z.), govara metîn, jmare(220).xula (4), l.l.(172- 193).**

**4-Сластенин В. А. , Чижакова Г. И.)2003) .Введение в педагогическую аксиологию: учеб.пособ. для студ. Высш. Пед.учеб. зведений.- м.: из- кий центр «академия», - 192с.**